Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1220 10-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


# Danasîna muzîkê û taybetmendiyên muzîka kurdî ya kevnar

Hemza Sêvo/ Qamişlo

**Muzîk awaz, rîtim û henaseya xweş e ku mirov di nav zanistê de vedîtiye. Muzîka kurdî jî heman tişt e, jê zêdetir jî, cihekî taybet di nav jiyana kurdan de heye. Bi dirêjahiya dîrokê re kurd di warê kultûr û muzîkê de gelekî kevnar û dewlemend in.**

Peyva music a bi zimanê inglîzî û mousike ya bi zimanê yûnanî, hunera rêxistinkirina dengan bi rêbazekî xweş û geş ji bo mirov e. Lê piştî lêkolînkirina zanista muzîka gelan û zanista cihêrengiya muzîkê ya li ser asta cîhanê hate der ku ev danasîn pir hêsan e ji bo muzîkê, ji ber ku pir wateyên berfireh jê re di sedsala 20'an de hatine destnîşankirin. Di wê demê de muzîk hat pênasekirin ku ew dengên xweş e, ji pêkhateya hevsengiya awazî û rîtmê pêk tê.

Muzîk ji cureyên deng û awazên amûran bi riyeke lihevhatî û bi rtim pêktê. Herwiha di seranserî dîrokê de muzîk dihate naskirin di derbirînkirina hestên mirovan de bi rengên cûr bi cûr û ji hev cuda û di dema nûjen de hate bikaranîn ji bo dermankirina piskolojiya mirovan.



**Hin taybetiyên muzîka kurdî ya kevnar**

Piraniya caran stranên kurdan li ser jinekê ye û pir kêm caran hestên dilxweşî û bi giştî jî hestên xemgînîbûnê tîne zimên. Dengbêj van stranan gund bi gund digerin, vedibêjin û gelêrî dikin. Di heman demê de vediguhêzin kesên dîtir, dengbêj dibin navgîna ku gelek mirov bi heman rêyê stranên bikar bînin û di nav gel de bidine belavkirin. Strana kevnar ya kurdan spartiye dubarekirina bendekê ye. Dema ji bendekî derbasî bendeke din dibe, tenê gotin tên guhertin. Hemû stran û lawik ( Serhewa ) ji serî heta dawiyê bi heman ruhî berdewam dike. Pasajên sivik (Bihereket) û coşdar ên ku herikîn an jî hewaya stranê qut bikin, nakevin navberê. Di vê yekê de, di destanan de hin taybetmendî hene. Ji bo her beşeke biaksiyon a destanê qalibê newayek ( Melodiyek) û rîtmeke cuda hene. Muzîka kevnar ya kurdan yekdengî ( Tekdengî ) ye û xwedî karakterekî 'vokal' e. Amûrên muzîkê gelek caran wekî armanc dide ber xwe ku guhdar bike û rewşeke wisa ku bikaribe peyama gotinên stranan baştir têbigihîje ango bi awayekî îzafî xwedî roleke talî ye. Karakterê koçberiyê, di asteke girîng de bandor li muzîka kurdan kiriye. Di dema pîrozkirina derketina zozanan an jî daketina germiyanan, çêbûna berxikan û berxbiriyê ( Qusîna hiriyê ), de stranên girêdayî dîrokê, xwedî cihekî girîng in. Muzîka kurdên ku bi çanda çiyan û di nava çanda deştan dijiyan, tiştekî cuda ye. Çendî li herêmên çiyayî stranên ku bêhtir sert, kirpandinên wan xurt û amûrên bayî li pêş bin jî, lê li nav kurdên deştî stranên ku bêhtir xwedî ruhekî aram û xwedî hej û amûrên jîdar in, hene. Di muzîka kurdî de hejmara berhemên ne reqsî pir kêm in. Bi giştî rêgezên ku têne bikaranîn jî; 6/8, 2/4,10/8 û hwd in. Herçiqas pêlawaz ku têne bikaranîn bi giştî rast, newrozî, kurdî, çargah, buselîk, hîcaz û hwd. bin jî, dikare bê gotin ku hemû meqamên li Rojhilata Navîn hene, têne bikaranîn. Di muzîka kurdî de bi awayekî giştî deng dikare di her astekê de dest pê bike, lê bi dengê bingehîn kuta dibe. Melodî bi giştî di seyreke berbijêr û berbijor-berbijêr de ye. Bi giştî di nav pîvanê de "es" ( Îşareta hiş be ) nayê bikaranîn. Amûrên muzîkê curbecur in, her yek jî dengek taybet derdixe û hestê her amûrek ku dide cuda ye. Ji ber wê jî di muzîkê de, li gorî dengê wê û hestê ku dide, her amûr cihên cudacuda tên bikaranîn.

## Heywanên di bin xetereyê de



**Hin caran mirov li hilberîneriyên xwe yên kevin vedigere û ji wan tiştên nû derdixe. Tûng Nam jî yek ji wan hunermendan e ku koleksiyonên xwe diparêzê û hin caran li koleksiyonên xwe yên berê vedigere. Ew sêwirînerê grafîkan û îllûstrator e û li Hanoî dijî.**

Tûng Nam beriya deh salan ji bo ku li cihekî stajê bike xebateke bi navê "Endangered Species Stamp Collection" (Cureyên Di Bin Xetereyê de-Koleksiyona Pûlan) pêk tîne. Piştî salan dîsa li heman xebata xwe vedigere û vê carê jê berhemeke cuda derdixe.

Di nav pûlên rengo rengo yên Tûng Nam de ku bi desen û temayên geometrîk çêkirine de qederê 15 cureyên heywanan ên ku êdî ew bi tinebûnê re rû bi rû mane hene. Li ser pûlên Tûng Nam di heman demê de navê van heywanan ên bi Latînî û senifandina wan a fermî jî heye.

Tûng Nam dide zanîn ku wî bi vê projeya xwe xwestiye xweşikiya van heywanan nîşan bide û wan biparêze. Ji bo ew ji hêla insanên din ve jî werin parastin dixwaze û îlhamekê ava bike û dibêje; "Heywanên ku min balê biriye ser wan bêhtir ew heywan in ku li Vîetnamê dijîn. Gelek ji van heywanan heger neyên parastin ew ê di siberojê de nifşê wan nemînin. Ji bo ku xelk hay ji vê meseleyê hebin û wan nas bikin min ev projeya îllûstrasyonan bire serî."

Sudoku: Bersiv 13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 5 | 9 | 2 | 6 | 1 | 3 | 4 | 8 |
| 4 | 2 | 8 | 7 | 5 | 3 | 1 | 6 | 9 |
| 3 | 6 | 1 | 4 | 9 | 8 | 5 | 7 | 2 |
| 2 | 3 | 6 | 9 | 7 | 5 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 5 | 3 | 4 | 2 | 6 | 9 | 7 |
| 9 | 7 | 4 | 8 | 1 | 6 | 2 | 5 | 3 |
| 6 | 4 | 2 | 5 | 3 | 9 | 7 | 8 | 1 |
| 5 | 8 | 7 | 1 | 2 | 4 | 9 | 3 | 6 |
| 1 | 9 | 3 | 6 | 8 | 7 | 4 | 2 | 5 |

Sudoku:Pirs 14

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 1 | | | 4 | 2 | 8 |
| | | | | | 4 | | | |
| 4 | 3 | 6 | | | | 1 | | 7 |
| | | | 8 | 3 | | | 4 | 5 |
| 7 | | | | 4 | | | | 3 |
| 8 | 4 | | | 5 | 2 | | | |
| 6 | | 7 | | | | 5 | 3 | 1 |
| | | | 6 | | | | | |
| 9 | 1 | 2 | | | 5 | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bi devê xwe nikare:**
- Gotinan digerîne; nizane tiştan xef bike.

**Devê wî bêhewş e:**
- Çi tê ber devê wî dibêje.

Devê wî sist e:
- Gotin xwe li cem nagirin; bi xwe nikare; nikare gotinan li cem xwe veşêre; tiştên ku pêwîst e nebêje dibêje.

**Devsist e/devê wî sist e:**
- Tiştan venaşêre, gotinan digerîne; ne yê baweriyê ye.

**Dikare distek girar di zikê xwe de hilîne, nikare peyvekê di zikê xwe de bihêle:**
- Gotin xwe pê re nagirin.

**Gotin xwe pê re nagirin:**
- Gotinan digerîne; nizane tiştan veşêre; bi devê xwe nikare.

**Ketiye devê wî:**
- Li her cihî dibêje; dev jê bernade; heman tiştî her tim dubare dike.

**Pîvazan zû spî dike:**
- Tişt xwe pê re nagirin; tiştên bi dizî eşkere dike.

**LI SER KARÊ BÊDIL**

**Bi serê zimanê xwe got:**
- Ne jidil got; ne bixwestek got.

**Bi ya kerê be kurtan lê nabe:**
- Hin kar hene ne divê ne li gorî dilê hina bin.

**Li min kir bar:**
- Bû erkekî bêdil; ne bi dilê min e; xist stûyê min; karê xwe bi hêviya min ve hişt; ji min re kir pirsgirêk; ne bi dilê min bû, lê ez neçarî kirinê kirim.

(Dema yek ne bi dilê xwe karê hin din dike, hingê tê gotin)

**Ne li gorî bayê dilê min lê xist:**
- Ne bi dilê min bû.

Pêlava min bi şûn ve ma/şekala min **bi şûn ve ma:**
- Çûyîn, (hatin, yan jî ew kar) ne bi dilê min bû.

**Suxre - Suxreya Filehan e:**
- Bê dilê xwe dike.

(Ji karê bê dil re tê gotin xuxre. Welatên Misilman lê serdest, berê Mesîhî ji xwe re dixebitandin)

**Şekala me li paş ma:**
- Çûyîn, (hatin, yan jî ew kar) ne bi dilê min bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Rêber Apo sedsala 21'ê bi jinê watedar kir



Di nava PKK'ê de xeta azadiya jinê veguheriye kanî û jêderke şaristaniya demokratîk. Jin bi hişmendiya PKK'ê niha di asta herî bilind de cih digire. Herwiha jinê di nava PKK'ê de rastiya xwe nas kir û di tekoşîna ewqas salan de karî mêjiyê koletiyê bi yê azadiyê biguherîne.**R-2**

## Neteweya Demokratîk...(1)

Têkoşîna neteweya bi armanca dewletê û dewleta bi armanca netewe, faktora sereke ya rastiya xwînrij a serdemê ye. Çavkaniya sereke ya pirsgirêkên serdema modernîteyê ew e, netewe bi desthilatdarî û dewletê ve kirin.**R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1220 10-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Armanc ji dagirkirinê qirkirina gelê kurd e



Ev nêzî 6 salan e dewleta Tirk a dagirker Serêkaniyê û Girê Spî dagirkir û dest danî li ser mal û milkên hemwelatiyan, armanca dewleta Tirk ji vê dagirkeriyê guhertina demografîke û qirkirina gelê kurd e.**R-6**

# DI BIN NAVÊ AŞITÎ Û BIRATIYÊ DE; QIRKIRIN

Desthilata AKP-MHP'ê ku li hundir û derveyî Tirkiyê kirîzên kûr jiyan dike, dixwaze bi rêya planên xwe yên qirkirinê van kirîzan derbas bike. Desthilata faşîst li aliyekî behsa aştî, demokrasî û biratiyê dike, li aliyê din jî qeyûman davêje ser şaredariyên kurdan, bi sedan kurdan binçav dike û sîstema işkence û qirkirinê ya li Îmraliyê dewam dike. Lê, berxwedaniya gel û têkoşîna civaka demokratîk wê van planên qirêj têk bibe.**R-3**














## Ji çiraxên hunera kurdî

Gelek hunermendên jin ên kurd karîn navên xwe di nav qadên hunerî û çandî de bihêlin û rola xwe di parastin û pêşxistina çanda kurdî de bilîzin. Di nav wan jinên ku karîn navên mezin di cîhana huner û afirînerî de bidest bixin, Nisrîn Botan e.**R-7**



Îmralî tekane rêya xelasiyê ye

Idrîs Henan R-5

## Mihemed Bêrem: Ji ber metirsiya ji modêla demokrasiyê êriş dikin



Hevserokê Partiya Sûriyaya Pêşerojê li kantona Efrîn û Şehbayê, Mihemed Bêrem diyar kir ku dagirkeriya Tirk hewil dide ji tevahiya aloziyên Rojhilata Navîn sûd werbigre û bi rêya êrişan pergala Neteweya Demokratîk ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hilweşîne.**R-5**

# Rêber Apo sedsala 21’ê bi jinê watedar kir

**Di nava PKK’ê de xeta azadiya jinê veguheriye kanî û jêderke şaristaniya demokratîk. Jin bi hişmendiya PKK’ê niha di asta herî bilind de cih digire. Herwiha jinê di nava PKK’ê de rastiya xwe nas kir û di tekoşîna ewqas salan de karî mêjiyê koletiyê bi yê azadiyê biguherîne.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Dîroka têkoşîna PKK’ê destaneke vejînê ye. Hem vejîna neteweyî ye, hem jî dîroka hêz û îradebûna gelê Kurd e. Têkoşîna PKK’ê kir ku gelê Kurd bibe gelekî ji bo jiyaneke azad û demokratîk têdikoşe. Di nava vê têkoşînê de gundek, kolanek, taxek, bajarokek û bajarek nema ku ranebû ser piyan. Bi hezarê caran rabûn serhildanê û li ser vê bingehê bi rêxistinbûna xwe şoreşa neteweyî, siyasî, demokratîk, çandî û civakî hate pêkanîn. Pênaseya “gelê serhildanê” ku Rêber Apo ji bo gelê Kurd kir, karakterê şoreşgerî yê gelê Kurd raxist pêş çavan. PKK’ê, gelê ku li cîhanê weke yê herî paşmayî dihate dîtin, kir gelê herî şoreşger ê pêşketî.



### Xeta azadiya jinê kaniya demokrasiyê ye

Nasnameya bingehîn a PKK’ê karakterê azadîparêziya jinê ye. Ev erdnîgariya ku şoreşa neolîtîk a bi pêşengiya jinê lê pêk hat, îro bi pêşengiya PKK’ê bi têkoşîna şoreşa demokratîk a li ser xeta azadiyê ya jinê, veguheriye kanî û jêderke şaristaniya demokratîk. Di şexsê gel û jinên Kurd de mirovahiyê îro berê xwe dane Rojhilata Navîn. Gelê Kurd bi têkoşîna azadiyê ya bi pêşengiya PKK’ê dimeşîne, wê ne tenê xwe azad û demokratîk bike, di heman demê de wê deriyê demokratîkbûnê jî li Rojhilata Navîn heta dawiyê veke û bi rengê ku li dîroka xwe bê, veguherîna dergûşa şaristaniya demokratîk. Ji bo PKK’ê zor û zehmetî nînin, lê hemû zor û zehmetî ji bo PKK’ê sedema têkoşînê ye.

### PKK’ê stratejiya parastina xweser û azadiyê nîşan dide

PKK’ê di nava kurdan de hişmendiya xweparastinê bi pêş xist. Hem gelê kurd ji pêvajoyên qirkirinê parast, hem jî ew kir xwedî hêz û helwest li hemberî faşîzma Tirk. Di tekoşîna ewqas sal de karî mêjiya koletiyê bi yê azadiyê biguherîne. Li ser wî esasî şêwazê xwerêvebirinê bi pêş xist. Îro li Rojava, Bakur, Başûr û Şengalê ev rastî tê dîtin. Hişmendiya xweparastin û xwebirêvebirinê bi derketina PKK’ê re di nava kurdan de gihaşt asta herî jor. Di roja me ya îro de di nava civaka kurd de, yekîne û saziyên xweparastinê hene.

### Jin bi hişmendiya PKK’ê gihişt lûtkeyê

Beriya PKK’ê jin di malê de sînordar bû. Ji ber paşverûtiya civakê jin ji mafê xwe bê par hate hiştin. Zextên civakê, zextên malbatê bi navê parastina namûsê jiyana jinê di tehlûkê de bû. Her cure êrîş, destdirêjî, zilm û zor li ser dihat dimeşand. Lê bi PKK’ê re, jin derbasî nava hemû warên jiyanê bû. Bû xwedî artêş, sazî, rêxistin û îradeyeke azad. Jin bi hişmendiya PKK’ê niha di asta herî bilind de cih digire.

### Rêber Apo sedsala 21’ê kir mîrasê jinê

Têkoşîna azadiya jinê û şoreşa jinê li dijî modernîteya kapîtalîst û hêzên hegemon wekî rojekê hiltê û cesaretê dide paşeroja mirovahiyê. Rêber Apo ji bo sedsala 21’ê dibêje sedsala şoreşa jinê. Yanî têkoşînek li dijî bêwateya demê ye û demê watedar dike. Şaristaniya ku 5 hezar sal’in desthilatdar e û mejiyê 500 hezar salî yê moderîteya kapîtalîst wekî mejiyê mêr pêvajoyek xerab pêş xistiye. Dem ew deme ku têkoşîna jinê ya bi wate li dijî berhemên bêwate yê mêran pêş dikeve. Ji ber vê yekê ev dem dema azadiya jinê û şoreşa jinê ye. Herwiha Dîroka 5 hezar sal bi berxwedana jinê derbas bû, lê bêyî jinê hat nivîsandin. Jinan gelekî li ber xwe dan, lê rêxistinbûyînek domdar nekarîn nîşan bidin. Lewma jî bi serneketin. Dîrok jî ji aliyê serkeftinên sexte yê mêran ve hat nivîsandin. Lewra jin bi parastinê dîroka xwe ji nûve dinivîse.

### Şoreşa “Jinê” şoreşa azadî û evîna rastiyê ye

Îro li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê pêdiviya sereke di çarçoveya felsefeya “Jin Jiyan Azadî” de îsyana xwe, pergala demokratîk û xweparastinê pêş bixin. Li gelek welatan û nasnameyên din jî li dora dirûşmeya “Jin Jiyan Azadî” hatin cem hev û bûn dengek. Ev jî dengê xweparastinê û têkbirina mêrê hegemon e. Divê sedsala 21’ê veguherînin sedsala şoreşa jinê û ev jî dengê xweşikbûn, azadî û evîna rastî ye. Divê ev deng qet bêdeng nebe û heta azadiya jin, civak û xwezayê mezin bibe.

### PKK’ê tevgera jinên azad e

Jinan xwe di nava PKK’ê de dît, nas kir û xwebûna xwe peyda kir. Rêxistiniya jinê ya ku li qadên siyasî, îdeolojîk û leşkerî hate afirandin, îro ji bo tevahiya jinan bûye qada têkoşînê. YJA STAR jî hêza parastina rewa ya vê rêxistiniyê ne. Jinên ku ji damezrandina PKK’ê ve bi rengekî çalak cihê xwe di nava her qadên rêxistinbûnê de girtin û bi rola pêşengiyê rabûn, li qada parastinê jî rola xwe lîstin û artêşbûna xwe afirand. Bêguman vê têkoşînê bi pêşengiya YJA STAR (Yekîneyên Jinê yên Azad) ên jinên Kurd; bi pêşengiya berxwedana YPJ, YJŞ û HPJ’ê kir ku jinên li tevahiya cîhanê berê xwe bidin xweparastin, nasnameya xwe û îradeya xwe.

### Pêşenga xeta Apo’î û PKK’ê Sakîne Cansiz e

Jinên ciwan îro bi ruhê Rêbertî û PKK’ê li hemberî êrîşên hovane ên dijmin li ber xwe dide. Tekoşer Sakîne yekemîn jin e ku cihê xwe di nava Tevgera Azadiyê de girt. Kesayeteke têgihîştî û zana bû, di warê dîrokî, felsefî û têkoşîna jin de xwedî rol û pêşengiyeke bê dawî bû. Ev yek bi tevahî jinan re parve dikir û ji bo pêşxistina wê xebatên bê navber dimeşand. Hevala Sakîna ji Dêrsimê bû, weke tê zanîn jî ku ev bajar di gelek komkujiyan re derbas bû. Herwiha rastî gelek êrişên pişaftin û qirkirinê hatin, şehîd Sakîne jî di nava rewşeke wiha de xwe bi bîrdoziya Rêber Apo pêçand û riya azadiya hilbijart. Di heman demê de şehîd Sakîna ji bû jinên têkoşer bû mîmara serxwebûn û azadiyê û îro roj li ser xeta wê bi hezaran jinên ji hemû pêkhateyan dişopînin û ruhê xweparastinê li pêş dixin. Meşa PKK’ê û azadiya jinê bi pêşengtiya têkoşer Sakîna dest pê kir, ev meş sînordarî çiyayên azad nebû, lê belavî cîhan û Rojhilata Navîn bû. Herwiha pêşenga xeta Apo’î û PKK’ê Sakîne Cansiz e.

# Di wênekêşiyê de gavên têkoşînê yên jinên kurd

**Navenda Nûçeyan**

**Evîn Abbasî ku bi xelatan ji pêşbirkên navneteweyî vegeriya, got:”Rewşa wênekêşiya jinan di civaka Kurdistanê de baştir bûye û tabû têne şikandin” û diyar kir ku ew her tim li ser jinan û tecrûbeyên wê radiwestin.**

Wênekêşên jin ên li Îranê bi wêneyên xwe hewl didin jiyanek tevahî bi çavên xwe vebêjin. Yek ji wan jinan jî Evîn Abbasî ye.

Di mihrîcana ku îsal li Kirgizistanê hat lidarxistin de, berhemên Evîn Abbasî ji aliyê Komeleya Wênekêşên Asyayê ve di asta navneteweyî de hatin xelatkirin. Evîn Abbasî di beşa ‘wênekêşana têgînî’ de bû yek ji 30 wênekêşên herî baş ên cîhanê. Hunermend di vî warî de xwediyê gelek xelatan e.

Evîn Abbasî li gundê Şûî yê Banê ji dayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî û navîn li Tehranê qedandiye. Xwendina xwe ya zanîngehê di beşa yasa de li zanîngeha Peyam Nûr a bajarê Seqizê qedandiye. Lê belê, wê hilbijart ku di wênekêşiyê de bibe profesyonel. Evîn Abbasî xebatên xwe weha vegot.

Evîn Abbasî têkildarî eleqeya xwe ya pîşeyî ya bi wênekêşiyê de jî got, “Ji sala 2016’an û vir ve bi awayekî cidî û profesyonel bi wênekêşiyê re eleqedar im. Şêwaza xebata min konseptî ye. Ez bi giranî di qada jinê de dixebitim. Sedema ku xebatên min di festîvalan de derdikeve pêş ev e. Ramanên nû û nûbûnên di rêbazên xebatê de ku karê min di warê wênekêşiyê de aktuel û balkêş dike.”

### ‘Tabû hatin şikandin’

Evîn Abbasî, da zanîn ku jin di karê xwe de bi gelek zehmetiyan re rû bi rû dimînin û got ku her ku hejmara jinan di vî warî de zêde dibe, tabû jî tên şikandin. Evîn Abbasî got, “Di dema dawî de ev tabû di civaka Kurdistanê de hatin şikandin. Berê hebûna kamerayek di destê jinekê de nedihate pêşwazîkirin. Kevneşopî û adetên di civakê de gelek astengî derdixistin, lê niha di vî warî de qada xebatên jinan zêdetir bûye. Gelek malbat hê jî nahêlin keçên xwe vî pîşeyî hilbijêrin. Di wê baweriyê de ye ku pîşeyê paşerojê nîne, lê cîhana îro cîhana deng û wêneyê ye û derfetên mezin û balkêş ji bo jinên afirîner di vî pîşeyî de hene. Bêguman wênekêşiya têgehî hîn bi têra xwe nayê zanîn û mirov niha bêtir bala xwe didin wêneyên xwezayê.”

### Di wêneyan de mijara sereke jin e

Evîn Abbasî, anî ziman ku mijarên wê herî zêde jin in û wiha got: “Sedema ku mijarên min bi piranî jin in ew e ku ez jî jin im û di nava vê civakê de dijîm. Ez bawernameya hiqûqê heye û di malbateke ku tê de bira nebûn de mezin bûm. Ev rewş her tim bû sedem ku kesên derdora min bi awayekî cuda li min û malbata min binêrin. Hemî van ezmûnan ji min re bûn alîkar ku şêwazek xebatê ya cuda bibim. Mijarên min ên wênekêşiyê bi giranî xwişkên min, jinên taxê û jinên civaka derdora min in. Ez di wêneyên xwe de rasterast peyamekê nadim temaşevanan; Belê her temaşevanek li gorî zîhniyeta xwe li ser wêneyan şîrove û ramanan dide û bi vî awayî rê li ber temaşevanan vedikim.”



Evîn Abbasî ku li welatên cuda beşdarî gelek pêşangehên navneteweyî bû û ji her pêşbirkê bi xelat vegeriyan, diyar kir ku ew dixwazin berhemên wê bigihêjin zêdetir mirovan.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Nisrîn Botan stêrka ku bi salan ronahiya wê diçirisîne . Ji demên kevnare û vir ve, ji civaka Kumînaliyê destpêkiriye, jinên Kurd mohra xwe li dîrokê dane û ispat kirine ku ew afrînerê şaristaniyan û perwerdekarên nifşan in.

Ew nîvê civakê ye û nîvê din jî ew xwedî dike ku ji mêj ve ronîkirina civaka xwe girtiye ser milê xwe û sedema sereke ya parastina ziman, çand û dîroka gelê xwe ye.

Ew bi hebûna xwe ya afrîner ji demên kevnar ve, çi di warê mîras û folklorê de, çi di cil û bergan de, çi di hêla muzîk û stranbêjiyê de tê nasîn. Hin hunermendên jin ên Kurd şopên ku newin jibîrkirî hiştine di warên cuda yên hunerên curbecur de, di nav helbest, huner û wêjeya Kurdî de, jina Kurd xwedî rabirdûyeke bi rûmet û îroyîneke ronake.



Gelek hunermendên jin ên Kurd karîn navên xwe di nav qadên hunerî û çandî de bihêlin û rola xwe di parastin û pêşxistina çanda Kurdî de bilîzin di nav wan jinên ku karîn navên mezin di cîhana huner û afirînerî de bidest bixin û navê xwe li wargehên çanda Kurdî ferz bikin yek ji wan hunermend Nisrîn Botan e.

Hunermend û stranbêja Kurd Nisrîn Botan di 9’ê Cotmeha 1982’an de li gundê Hilko yê girêdayî bajarê Qamişlo, bajarê çand û zanistê, bajarê evîn û aştiyê, ji du dê û bavên kurd (Ebdul Celîl û Ezîze) hatiye dinya yê, ew di nav malbateke kurdperwer ya welatparêz de, ku mişt ji ruhê neteweperweriyê û heskirina welat ku ji neh zarokan (çar keç û pênc kur) pêk tê, mezin bûye, malbata wê derî û dilê xwe ji tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê re vekir û zarokên wê di destpêka salên notî yên sedsala borî de tevlî refên têkoşîn, şoreş û çalakiyên gelêrî, çandî û hunerî bûne û tişta ku herî giranbuha û bi rûmeta li cem wan û kezeba xwe pêşkêş kiriye ji bo doza xwe, azadî û rizgariya welatê xwe Kurdistanê.

Nisrîn Mihemed dibistana seretayî li gundê Hilko û qonaxên amedeyî û navîn li bajarê Qamişlo xwendiye. Meyla wê ya hunerî û hezkirina wê ya ji bo stranbêjî, muzîka kurdî û folklora kurdî di ciwaniya xwe de, hîn di sêzdeh saliya xwe de destpêkiriye, di bin bandora xwişka xwe ya şehîd Mezgîn de ku di wê demê endamê koma Botanê bû.

Hunermend Nisrîn di sala 1995’an de tevlî koma Botan ya hunerî bûye dema ku di qonaxa dibistana navîn de bû bi rêya xwişka xwe şehîd Mizgîn, di destpêkê de beşdarî beşa dîlanê û paşê şanoyê û di sala 1997’an de tevlî beşa muzîk û stranbêjiyê bûye, û heta îro jî hîn ew berdewame di koma Botan de kar û xebatê dike.

Hunermend Nisrîn di sala 2001’ê de zewicî û dayika sê zaroka ye (du kur û yek keç) .

Di sala 1999’an de dest bi kariyera xwe ya hunerî kiriye û paşê bi stranbêjiyê beşdarî aheng û şahiyên netewî û helkeftên niştimanî bûye. Ew beşdarî kasêta koma Botan ya sêyem bûye bi strana xwe ya bi navê (Kurdistan)ê. Di gelek stranên Koma Botan de cih girtiye û di wan stranan de roleke sereke lîstiye. Bi taybetî piştî destpêkirina Şoreşa Rojava, wê di gelek stranên cihêreng û gelêrî de wek strana “Wa Şehîd, Dehola Şer, Herderî Serhildane” û gelek stranên din de roleke girîng lîstiye.

Li Rojavayê Kurdistanê li hemû bajar û bajarokan, bi koma Botan re û him bi tena serê xwe beşdarî gelek konser û festîvalan bûye. Weke hunermend zêdetirî carekê li derveyî Rojava, li Rûsiya, Herêma Kurdistanê, Libnan û Şamê, beşdarî gelek şahî, festîval û ahengan bûye.

Hunermend Nisrîn Botan di damezrandina Yekîtiya Hunermendên Cezîrê de roleke sereke lîstiye û zêdetirî du salan hevserokatiya Yekîtiya Hunermendên Cezîrê kiriye,di wê heyamê de bi hevalên xwe re gelek konser û festîvalan pêşkêşkirine, wek:
- Festîvala Bizqê
- Festîvala Stranan
-Lidarxistina şahiyên muzîkê yên heftane ji bo hunermendan.

Her wiha di dema karê xwe de weke hevserokatiya “Yekîtiya Hunermendên Cezîrê” û bi komîteyeke hunerî re straneke hevbeş çêkirine, tê de 27 hunermendên Rojavayê Kurdistanê ji hemû aliyên siyasî beşdar bûne, di nav wan de ew (Nisrîn Botan) û gelek hunermend û stranbêjên Kurd li Rojavayê Kurdistan hebûn, wek:(Beha Şêxo, Amir Remo, Îmad Xelef û gelek hunermendên din) Strana wan bi navê “Ev Walat” ku têde behsa yekîtiya kurdan dikir. Her wiha hunermend Nisrîn Botan di sala 2020’an de beşdarî straneke hevbeş ya bi navê “Banga Netewî” bûye bi stêrkên sereke yên hunera Kurdî yên wek (Xelîl Xemgîn, Diyar Dêrsim, Dilovan, Bengîn Efrînî, Mihemed Bilko, Bilind Îbrahîm, Çobî Fetah, Deniz Deman, Mizgîn Tahir, Şivan Perwer, Niyazî, Yasmîn, Sefqan Orkêş, Ciwan Hesen û çend hunermendên din ên kurd re) strandiye.

Di salên (2019-2021)’an de hevserokatiya Tevgera Çand û hunera Mezopotamyayê kiriye û hunermend Nisrîn gelek stran amade kirine ku dê di demek nêzîk de belav bike.

Hunermend Nisrîn Botan heta niha deh stranên netewî û şoreşgerî yên taybet bi navê xwe tomar kirine û ji stranên wê yên herî navdar ev in: “Efrîn, Leyla Goven, Welatê Min, Dayîkim Ez Dayîkim” , ev stran hemû di nava germahiya şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hatin çêkirin û hemû bûn videoklîp, ji bilî beşdarbûna wê di gelek stranên hevbeş de li gel komên hunerî û hunermendên Kurd li Rojavayê Kurdistanê.

Her wiha ew bi stêrên sereke yên hunera kurdî re beşdarî şahî û çalakiyên neteweyî bûye, wek (Aram Dîkran, Cewad Merwanî, Beha Şêxo û hin hunermendên din ên kurd) Di demeke nêzîk de bi koma Botan re hin projeyên wê yên mezin hene wê pêkwerin. Stranên wê şêweyê evîna welat û xweza, herwiha stranên mîrate û folklora kurdî ya resen wergirtiye, wê ji bo welat, ji bo şoreşê, ji bo dozê, ji bo parêzvanên welat, ji bo jinan, ji bo azadî, ji bo şehîdan, bi dengê xwe yê xweş û hestên xwe yên nazik strandiye, stranên wê xwe nêzîkî hest û henasên gelên herêmê dikin, birînan derman dikin û dilan şa dikin.

Guman tune ku navdarî teysîneke ku çavan dikişîne ser xwe û mirovan dixapîne û ber bi xwe dibe, nemaze ku ew bûye rêyek hêsan ku rê vedike li ber têgihîştina jiyanek dewlemend, zêdegavî, diyarî, rêwîtî, pêşandan û diyardeyên din ên keyfxweşî û bextewariyê, lê Nisrîn bi xweşiya jiyanê û xweşîbira Ewropayê nehate xapandin, lê wê çêtir dît ku li Rojavayê Kurdistanê di nava gelê xwe û malbata xwe de bimîne û ew tevî hevjîn û zarokên xwe li bajarê Qamişlo bijî. Bîst û şeş sal borîn hîna jî ew li ser rêya xwişka xwe ya şehîd dimeşe, ku soz dabû wê, rêya wê berdewam bike û li ser şopa wê bimeşe, heta îro jî stranên herî xweş ên netewî û folklorî pêşkêş dike bê westandin û rawestandin, wê pirtûkxaneya hunera kurdî bi stranên xwe yên hêja dewlemend kiriye.

Di karê wê yê hunerî de serkeftin, afirandêrî û geşbûna zêdetir jê re dixwazim.

# Serpêhatiyên veşartî yên jinan

Yara Hesko şêwekareke Efrînî ye. Wê niha pêşangehek vekiriye li Qamişlo û di tabloyên xwe de bi serpêhatiyên veşartî yên jinan dadikeve. Nexasim jî tesîrên dagirkeriyê yên li ser jiyana jinan, şer û êrîşên li Rojava di tabloyên wê de beloq dibin.


Yara Hesko şêwekar û koçbera ji bajarê Efrîna ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin e. Niha li bajarê Qamişloyê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijî. Yara bi piştgiriya dost û hevalên xwe di 1’ê Mijdarê de li navçeya Amûdê- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yekemîn pêşangiha xwe vekir. Yara çîrok, hûrguliyên li ser pêşangehê û pêvajoya jiyana xwe ya hunerî bi me re parve kir. Yara Hesko da zanîn ku salek li ser pêşangeha xwe xebitiye û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Min pêşangiha xwe bi 26 tabloyên rengîn vekir. Nêzî salek e amadekariyên vê pêşangiha xwe ya taybet dikim. Min xwest beriya çend rojan vekim lê ji ber ku êriş li ser Rojavayê Kurdistanê hebûn, ez mecbûr mam çend rojan dereng bixim. Di 1’ê Mijdarê de pêşangeha min hat vekirin û dê hefteyek dewam bike.”



Yara Hesko ji sala 2018’an ve beşdarî gelek pêşangihên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûye ji bilî xebatên li derve. Yara di vê derbarê de got: “Li Şam û Helebê beşdariya min a pêşangehan çêbûye. Salek berê 10 tabloyên min li pêşangiha Silêmaniyê li Başûrê Kurdistanê hatin pêşkêşkirin. Di heman demê de çi pêşangihên navneteweyî hebin beşdarî wan jî dibim.”

### Dagirkirina Efrînê bandor li humera wê jî kir

Yara Hesko di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser pêvajoya zarokatî û dagirkirina bajarê wê Efrînê, ber bi koçberiyê ve bandora li ser jiyana wê û wiha pê de çû: “Ji zarokatiyê ve min ji wênexêziyê hez dikir. Piştî sala 2018’an serpêhatiyên min girantir bûn. Ez ji şêwaza vegotinê hez dikim, dibe ku zarokatiyê bandorê li min kiribe. Ez xwe di wênexêziyê de dibînim, dema ku tabloyan xêz dikim xwe bi eşq hîs dikim. Şêwekarî bûye sîstema jiyana min, nikarim bê çêkirina tabloyan rehet bibim. Piştî dagirkirina Efrînê, bêtir bi hunerê ve hatim girêdan. Ji min re bû bêhnvedanek ku tê de hestên xwe bînim ser ziman. Bi awayekî zindî êşa xwe naynim ziman, tenê bi rêya tabloyan dikarim hestên xwe bidim der.”



### Bi formên jinan dadikeve

Şêwazê Yara Hesko ya xêzkirinê bi forma jinan diyar û balkêş e. Her tabloyek hest û çîrokeke veşartî ya jinekê vedibêje, ew di vê derbarê de wiha nêrîna xwe tîne ziman: “Rast e di tabloyên min de forma jinan heye, êşa xwe û derdorê parve dikim. A girîng ew e ku her kes dikare xwe di van tabloyan de bibîne û pê hîs bike.” Yara Hesko destnîşan kir ku ew amadekariyên bi hêztir dike ji bo pêşeroja xwe û wiha bi dawî kir: “Piştî vê pêşangehê, ez amadekariya tabloyên nû dikim. Di pêşerojê de ez ê wan jî pêşkêş bikim û bi hêvî me ku tabloyê min tenê li vir nemînin, derfet hebe her kes wan bibîne.

**NÛ JINHA**

# Armanc ji dagirkirinê qirkirina gelê kurd e

Ev nêzî 6 salan e dewleta Tirk a dagirker Serêkaniyê û Girê Spî dagirkir û dest danî li ser mal û milkên hemwelatiyan, armanca dewleta Tirk ji vê dagirkeriyê guhertina demografîke û qirkirina gelê kurd e.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker ji 9'ê Cotmeha 2019'an ve Serê Kaniyê û Girê Spî dagirkir, di encama dagirkirina dewleta Tirk ji xaka pîroz re gelek çîrokên bi êş li pey xwe hiştin. Her wiha bicihbûna welatiyan di konan de û derbasbûna wan bi zehmetiyan re bandorek neyînî li wan kir.
Di derbarê rewşa kampê û koçberan hemwelatiyên bi navê Rizgar Şêx Elî, Wetha Berho û Nûra Hemûd ji Rojnameya me re axivîn.

**Çîroka Rizgar Şêx Elî**

Rizgar Şêx Elî xelkê serê kaniyê ye diyar kir ku ev 9 sale hevjînê



**Rêzgar Şêx Elî**

wê şehîd ketiye 4 zarokên wê hene li Serê Kaniyê di nava kar û xebatên asayîşê de cihê xwe digirt, niha jî di şaredariyê de kar dike û wiha got: "Dema ku çeteyên DAIŞ'ê êrişê Serê Kaniyê kirin, wê demê ber banga sbehê bû û hîn em di xewdebûn, bi êrişê re em bi lez û bez ji xew şiyarbûn û me hertişt li pey xwe hişt û em reviyan. Dema min çav zarokên





**Wedha Berho**

xwe dikir di vî halî de kezeba min dişewitî. Dema em koçber bûn em hatin bajarê Hesekê li Mişêrifê li maleke biyanî man. Ev nîzî 5 sala ye em di kampa Waşokanî de bi cih bûne, daxwaza min ew e ku vegerim li ser axa xwe, ji ber ku ew ax tenê hêjaye malê dunyayê, nîvê gelê me ji êşa dûrbûna wan ji warê wan bi nexweşiyên giran ketin, yek ji wan jî dayîka min bû û ew ji roja koçber bûnê heya îro ev 4 cara kirîza dil pê re çêdibe. Hêviya me em vegerin cihê xwe ji ber ku her kolanek ji bajarê me xwedî bîranînekiye."

**Astengiyên ku me di dema koçberiyê de dîtine**

Wetha Berho da zanîn ku temenê wê 60 salîye ji Serê Kaniyê ye lê ji ber dagirkirina dewleta Tirk ji bajarê sere kaniyê re ew neçar ma ku dev ji bajar berdin. Ev



**Nûra Hemûd**

nêzî 5 sale di kempa Waşokanî de ew û zarokên xwe bicih dibin û wiha got: " Em gelek zehmetiyan di hundirê kampê de dibînin yek ji wan jî kêmbûna nane, herkesek du nan jê re derdikevin lê ev yek ji bo me kême loma tevî mezinbûna temenê min jî lê ez neçar dibim nan çêbikim. Lê di çêkirina nan de jî em zehmetiyan dibînin, her meh carekî kêlok ard didin me, ji bo çêkirina nan kêlok têrê nake em ji cîranên xwe yên ku nehewcedarî ardin dikirin. Tevî ku gelek nexweşî bi min re ne û hertim bijîşk dibêjin tu hewcedaî rehetiyê yê, lê ez neçarim ji bo zarokên xwe çêkim. Daxwaza me ew e ku em vegerin û jiyana xwe ya berê di mala xwe de berdewam bikin, ji ber ku jiyana di hindirê kampê de pir zor û zehmete."

**Zehmetiyên ku di Zivistanê de hemwelatî dikşînin**

Nûra Hemûd diyar kir ku temenê wê 55 salî ye malbata wê ji 10 kesan pêk tê ji Serêkaniyê ne û di kampa waşokanî de bicih bûne û wiha got: "Di kampê de em gelek astengiyan dibînin dema berê mûnet du par didan me, lê niha parek ji me qutkirine tevî ku hijmara me geleke jî û têra me nake. Rojane ji me re avê tînin, lê em pirî caran bê av dimînin, ji ber ku her pênc kon li ser bermîlek av debara xwe tînin, hejmara me geleke heger mirov xwe zû negihande avê û para xwe negirt dibe ku wê rojê bê av bimîne. Her wiha her sal ji bo hatina demsala Zivistanê çadir didan me, lê îsla nedan û çadirên me hemû qetane û jiyana zivistanê zehmete ku di bin wan de were qedandin. Dema berê wek vî demî mazot didan me, lê heya niha nedane û par mazota dayîn hîn nebû nîvê zivistanê jî xilas bû. Di heman demê de em daxwaza sopek nû dikin, ji ber ku pênc sal çûn li ser derbasbûna sopa me re û nema bikêrî pêketinê tê, lê tiştek ji daxwazên me pêk nayînin wê zivistana îsal çawa derbas bibe bi van astengiyan re nediyare."

# Welatî ji neçarbûnê sobeyên xwe yên kevin çeksaz dikin

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Ji ber buhaya zêde, welatiyên bajarê Qamişlo ji bo kirîna soban zehmetiyên mezin dibînin û ji neçarî sobeyên xwe yên kevin çeksaz dikin. Bazrganan jî bilinbûna buhayên soban bi bilindbûna nerxê dolar û comrekeya ku hikumeta Şamê distîne, girê didin.**

Dewleta Tirk a dagirker rojane êrişî binesaziya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike ev yek dihêle rê li ber pêşketinên di herêmê de were girtin û gel rastî astengiyan were. Ji ber tinebûna rafîneriyên mazotê tenûra soban xira dibe, gel neçar dibe berê xwe bide kirîna sobeyên nû, lê ji ber ku kargehên sobeyan di herêmê de nînin û ew ji bajarên Sûriyê ku di bin kontrola hikumeta Şamê de ne tên, buhayê wan gelek girane.
Derbar buhabûna soban bazirgan û çeksazê sobeyan, herwiha welatiyên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.
Bazirgan Mado Mado ji bajarê Qamişlo diyar kir ku bi hatina demsala Zivistanê re gel dest bi kirîna soban dike û wiha got: "Buhayê kirîna soban îsal û par wek hevin, lê pirsgirêk bilindbûna dolare, ev yek nerazîbûnê li cem gel çêdike. Di heman demê de sobe hemû ji aliyê hikumeta Şamê ve tên û gumrik li ser wan heye û heta ku dighêje destên me buhayê wê deh qat lê zêde dibe. Li cem me gelek cûreyên soban hene û her yek ji wan buhayê wan cûdaye, ji 375 hezarî heya milyon û 200 hezarî heye. Boriyê soban jî ji 15 heya 24 hezarî hene. Cûreyên ku em tînin; Elfelah, Elesîl, Kewkeb Elşerq e. Daxwaza me ew e ku Rêveberiya Xweser bibe alîkar bi me re da ku gumrik rabe ji ber ku rewşa gel ya madî ne gelek başe û kirîna soban nebe asteng ji wan re."



**Mado Mado**

**Buhabûna dolar bandoreke neyînî dike**

Welatiyê bi navê Yûsiv Mihemed Tahir ku karê firotina goran li ser bestekê li bazara Qamişlo dike da zanîn ku her ji ber her tiştê welatî dikirin bi dolare, ew gelek astengiyan dibînin û wiha got: "Niha jî demsala zivistanê hat û em hewcedarin ku soban bikirin û sobe jî buhayê wan giranin. Ji me nayê em yê herî qenc bikirin, lê ji bo debara zivistanê em yeke buhayê wê li gor rewşa xwe ya madî dikrin, lê ji ber rafîneriyên mazotê li



**Yûsiv Mihemed**

herêmê nînin û başbûna mazotê kême, tenûrên soba xirab dibe û pêwîste her sal werin nûkirin. Sobe ji kêmanî her sê salan divê em biguherin. Hêviya me ew e ku aloziya Sûriyê çareser bibe û gel bighêjin mafên xwe."

**'Bandora çaksazkirinê li ser tenduristiyê'**

Çaksazê soban Selîba Ebdulmesîh ku temenê wî 70 salî ye diyar kir ku ev nêzî 6 salan e ew karê çeksazkirina soban dike û wiha got: "Ez him sobên nû difroşim, him jî soban çaksaz dikim. Îsal piraniya



**Selîba Ebdulmesîh**

welatiyan berê xwe dane çaksazkirina tenûrên soaban, ji ber ku sobeyên nû buhne. Astengiya ku em dibînin ew e ku ev kar bandorê li tenduristiya me dike û em gelek diwestin jî. Di heman demê de kesên ku tên ber destê me jî kar dike kirêyeke giran dixwazin heya ku qebûl bikin bimînin. Ez sobeyên girover yên biçûk û mezin bi 40 hezarî çaksaz dikim lê yê çargoşe bi 85 hezarî çaksaz dikim. Piraniya sobên ku tên bajar Himis û Şamê tên ev yek bandorê li bihayê sobê dike. Dema tên jî bi rê de gelek astengî derdikevin û dolar jî buha dibe lewma gel gazindan dike."



# Di bin gotina aşitî û biratiyê de gefên qirkirinê

Desthilata AKP-MHP'ê ku hem li hundir hem jî li derve xitimiye bi taktîkên nû hewil dide siyaseta xwe ya berê bizivirîne. Ew bi zihniyeta xwe heman siyasetê dimeşîne û tecrîda li ser Rêber Apo didomîne. di bin gotina aşitî û biratiyê de ya Erdogan û Beçelî de gefên qirkirin û qetlîamê hene.

**Amara Baran/Qamişlo**


Li hemberê îradeya gelê kurd û li hemberê gelê kurdîstanê derbeyek din a siyasî ji aliyê desthilata AKP-MHP ve qeyûm hatin kirin 3 şaredariyên gel ( Mêrdîn, Batman û xelfetî) hate dagirkirin. Li dijî van erîş û derbeyên siyasî berxwedana gelê kurd didome, ji bo mezinkirina tekoşîna li dijî desthilata faşîst a ku dixwaze kurdan qirbike û îradeya gelê kurd nasnake. Bi fermana şefê faşîst Erdaxan û bi telîmata wezareta tirk a navxweyî şarederiyên gel dagirkirin. Gel bi tekoşîna xwe neyamek xort da dagirkeriya tirk û got" emê li berxwe bidin faşîzmê û pergala qeyûm a talanger têk bibin. Pişte 8 salan 4 mijdarê de li dijî îrada gel darbe pêk hat, wezarta navxweyî a tirk bi fermana şefe faşîst Erdoxan dest danîn li ser şaredariyên Mêrdîn, Batman û Xelfetiyê. Hêzên dewleta tirk a dagirker nehîşt ku kes bikeve şaredariyan, bi bîhîstina buyerê re gel berê xwe da şaredariyan û li dijî darbeya faşîst dest bi berxwedanê kir.

**Dewleta tirk xwediyê zîhniyeta qirkirinê ye**

Gele kurd gelek destkeftiyan bi tekoşîna xwe Şarederiyên gel yên li bakur û tirkiyê bidestxistin, şoreşa Rojava mînaka vî ya herê mezin û berbiçave, şoreşa rojava xwe sipartiye rastiya Rêber Apo jî spartiye, yên ku tekoşîna xwe rêveberiyê esas negirtin û yên ku beşdarê hezên polîtîkayên serdestbûn guhertin. Metirsiya li ser kurdîstanê bi taybet li ser şoreşa rojava bi dawî nebuye yên ku vî xeteriyê diafirine dewleta tirke, dewleta tirk xwediyê zîhniyeta qirkirinê ye rastiya kurd înkar dike û dixwaze ji holê rake dixwaze bi qirkirina kurda dewletên heremî jî bike bin xitma xwe û hegemonyake li ser heremê avabike. Li hemberî vî pêwîste tekoşînê zedetir xortbikin û xwe parastinê pêşbixin ancax bivî rengê bikaribin erîşan vala derbixînin.

**Desthilatdariya AKP-MHP' di hindir û derve de xitimiye**

Desthilata AKP-MHP'ê ku hem li hundir hem jî li derve xitimiye bi taktîkên nû hewil dide siyaseta xwe Ya berê bizivirîne herçiqas li tirkiyê nîqaş çêbûn jî lê tu gûhertineke bingehîn tuneye desthilata AKP-MHP'ê bi zihniyet û siyaseta xwe bi heman rengê didomîne, û tecrîda li ser Rêber Apo didome, Rêber Apo bi gotina ku' tecrîd dewam dike' nîşan dide ku dewlet nêzîkatiya xwe ya bere didomîne tiştên ku Erdoxan û Bahçelî dibêjin tehdît û şantajin di bin gotinê aşitî û biratiyê de gefên qirkirin û qetlîamê hene. pir vekirî heqaret li gele kurd û îradeya gele kurd dikin û dixwazin ku gel dev ji tekoşîna xwe berdin û teslîm bibin. Erîşên hovane yên li ser Rojava û desteserkirina îradeya gel ji aliye qeymaqam û valiyên dagirker ve plana dewleta tirk a dagirker derxistiye holê.



Di hevdîtina pişte 5 salan a lî Îmraliyê de Rêber Apo helwesta xwe ya ji bo çareseriyê bi awayek zelal nîşan da lê belê bersiva dewletê a li hemberî vî ew bû ku berê xwe bide rojava û li bakur jî bi rêya qeyûman dest bidin ser şaredariya û zorê dan qirkirina siyasî û eskerî, herê dawiyê derket holê ku tecrîda li ser Rêber Apo bi cezayên dîsîplînê hatiye dûbarekirin û dirêjkirin, tecrîd tê wateya politikaya qirkirinê. Erdoxan di raya giştî de got ku mizginiyekî me ji bo we heye ji bo Rojava tehdîteke nû a dagirkeriyê bike meriyetê û îradeya gel xesp bike.




**Hedefa dewleta tirk qirkirina gelê kurde**

Mesela dewleta tirk ne mesala kayum avêtina ser şaredariyane, mesela dewleta tirk qirkirina gelê kurdê di milekî de bi dijwarî êrîşê heremên parastina medya yê dike, ji milekî de jî êrîşên rojavayê kurdîstanê dike. Rojava bixwe jî di xeteriyê de ye lewma ji bo parastina hemû destkeftiyan parastina Rojava û parastina şoreşa rojava ji berê zêdetire, temsîla iradeye gel a şoreşa rojava ne tenê ji bo gele kurd bi taybetî ji bo rojhilata navîn gelekî girînge di heman demê de ji bo tevahiya cîhanê jî girînge, çima şoreşa rojava ewqas girînge roj bi roj girîngiya wî zelaltir dibe.

**Li Rojhilata Navîn roj bi roj şer gurtir dibe**

Rewşa rojhilata navîn jî bi awayek pir zelal li holê ye ku îro şer roj bi roj gurtir dibe. Yên ku dibin sedema vî şerê jî hêzên moderînîta kapîtalîstin ji berk u di nava hêzên moderîniteya kapîtalîst de pirsgirêkên hêz û serdestiyê hene. Divê hêzên moderînîteya kapîtalîst tene wek hêzên navneteweyî û yên wekê DYA, û înglîstanê neyên dîtin, dewletên heremê yên wekê tirkiyê û îranê jî hêzên moderníteya kapîtalîstin. Îsraîl jî wek dewleta tirk ji hêzên navnetewî destekê digre û li gor planên wan tedigere. Desthilatdarî û planên serdestiyê hem hêzên navnetewî yên wek ê Emerîka û Înglîstanê hem jî hêzên heremî yên weke tirkye, Îran û Îsraîlê dibin sedema kurbûna şerê li rojhilata navî. Ji van hêzan yek jî xwe naspêre gel û azadiyê berovajî ji bo bi destxistina desthilatdarî û serdestiyê. Em niha jî dibînin ku çi bi serê gelê filîstinê ve tê, komkujiyên ku dewleta tirk pêk tîne jî eşkere li holêye tişta ku îro diqewime jî heman tiştê, tişta ku bi gele filîstin û bi gele kurd hat kirin di dîrokê de minakê wî tuneye, li aliye din komkujiyê îsraîl û dewleta tirk jî ji plana ji nüve dizaynkirina rojhilata navîn ne ser bixwe û cûda ne ev hemû hêz ji bo berjewendiyên xwe mirovan dikin qurbanî, bi taybetî divê em ji tecrûbeyên gelên filîstinê dersê derbixin. Taybet dewleta tirk û îran ji bo ku di projeya nû a Rojhilata navîn a ji aliyên hêzên navnetewî ve hatiye çekirin de xwe bi cih kirine û ji bo ku mevziyên xwe ji dest nedin mirovan dikin qurbanî. Ji berk u projeya rojhilata navîn a nû ya hêzên navnetewî hevsengiyên berê xira dike, hêzên wek tirkiye û îranê ji vî ditirsin ji ber ku dewleta tirk û îranê ji hêzên hegemonîkin naxwazin hegemonya xwe ji dest bidin ji bo wî jî mirovan dikin qurbana siyaseta xwe ya qirêj.

**Rêber Apo bi awayek pir zelal şerê Rojhilata Navîn analîz kir**

Di erîşa hamas û îsraîlê de mînaka vî bi awayek eşkere derket holê dewleta tirk û îranê bi êrîşa Hemasê a li ser Îsraîlê gelê Filîstinê kire qurbaniya polîtîkayên xwe. Taybet rola faşîstê tirk Erdoxan divî de diyar bû ji ber vî nêzîkatiya Erdoxan û dewleta tirk li hemberê filîstinê bi tevahî li ser esasê bi kar anîna gelê filîstinêye, hemas jî buye amûrê vî siyasetê û bi bûyîna partiyeke tekoşîna hegemonya hêzên heremî û navneteweyî zirarek mezin daye doza gelê kurd. Rêber apo ji herkese zêdetir şerê cîhanê ê sêyemîn analîzkir û çawa çima pêşket û divê gel çawan tevbigere hemûyan analîz kir ji bo ku em fambikin pêwîste em bixweynin û analiz bikin ger em baş fambikin emê şerê rojava rojhilat û cîhanê jî fambikin û emê bizanibin çawa tevbigerin û wî demê tehdît lîstêkên şerê taybet yên dijmin têk bibin. Rêber Apo got ku" şerê cîhanê ê sêyemîn di navbera hêzên serdest pêk hatiye pêwîste gel li gor hêz û tekoşîna xwe geşbike û pêş bixe"

# Neteweya Demokratîk...(1)

**Ji ramanê Rêber Apo**

Têkoşîna neteweya bi armanca dewletê û dewleta bi armanca netewe, faktora sereke ya rastiya xwînrij a serdemê ye. Çavkaniya sereke ya pirsgirêkên serdema moderniteyê ew e, netewe bi desthilatdarî û dewletê ve kirin. Em wexta ku pirsgirêkên serdema moderniteyê bi pirsgirêkên çavkaniya xwe dewletên xanedan û dîktator in, bidin ber hev, cudahiya herî mezin a di navbera wan de dewleta netewe ye. Dewleta netewe ya yek ji mijara herî tevlîhev a zanista civakî ye, bi awayê xuya dike, mîna çoyekî bi sêhr pêşkêş dikin ku bi tevahî pirsgirêkên nehemdem û li dijî moderniteyê ne, ji hev derdixe. Lê bi xwe jî pirsgirêka civakî ya ku yek e, dike hezar. Sedema vê yekê jî ew e, wê mekanîzma û çerxa desthilatdariyê heta bi mûrehkên civakan belav kiriye. Desthilatdarî bi xwe pirsgirêkan çêdike; ji ber karekterê wê yê potansiyel ê di şêweyê zorê yê sermayeyê de bi rêxistin bûye, weke zordestî û mêtinkarî pirsgirêkên civakî çêdike. Civaka netewe ya homojen armanca dewleta netewe ye, û bi desthilatdariyê welatiyên (qaşo bi huqûqê) wekhev ên sexte yên bi şîddetê barkirî û lihevçêkirî yên ku hemû endamên wan bi birrekê hatine birrîn û mîna diranên şeh kirine wekhev, çêdike. Ev welatî bi gotina qanûnê wekhev in, lê di her qada jiyanê de weke ferd û hebûneke kolektîf heta tu bêjî ji wekheviyê dûr in.

Moderniteya kapîtalîst wexta xwe weke dewleta netewe bi rêxistin dike, ji rêxistinkirina bi awayê yekdestdariya ekonomîk zêdetir bi roleke zordest û mêtinkar radibe. Marksîzmê û bi giştî sosyolojiyê têkiliya dewleta netewe bi zordestî û mêtinkariyê re baş nedîtine yan jî dewleta netewe weke saziyeke joravahî ya gelekî ji rêzê pêşkêş kirine û ev yek jî kêmasî û berevajîkirineke bingehîn e. Dema ku analîza çîn û sermayeya maddî ji dewleta netewe serbixwe bê kirin, wê weke gotinên gulover ên ji encameke civakî şuştî û muceredkirî yên herî bêtahm û bêber bêne hesibandin. Di binê serneketina sosyalîzma pêkhatî de ev muceredkirin heye; ya rastî di vê serneketina wê de encamên bi vê muceredkirinê ve girêdayî bi bandor bûne.

Netewe weke têgîn, ew şêweyê civakê yê klan, qebîle û eşîrên xizm e ku piştî awayê qewm, gel an jî millet tê, û xwe herî zêde li ser wekhevbûna ziman û çandê karekterîze dike. Ji lewra civakên neteweyî, li gorî civakên qebîle û qewman bêhtir xwedî hecmekî berfireh in, û bêhtir cûrbicûriyan digirin nava xwe, lewma ji komên mirovan ên bi têkiliyên sist bi hev ve girêdayî pêk tên. Civaka neteweyî zêdetir diyardeyeke serdema me ye. Eger mirov wê bi awayekî giştî bide naskirin, mirov dikare bibêje ew koma kesên xwedî zêhniyeteke hevpar in. Ango diyardeyek e ku bi awayekî zêhnî heye. Lewma hebûneke mucered û xeyalî ye. Em ji vê re dikarin neteweya bi çandê pênasekirî jî bibêjin. Ji aliyê civaknasiyê ve danasîna rast jî ev e. Tevî cudahiya çîn, cins, reng, etnîsîte û heta koka cuda ya neteweyî jî kengî bi awayekî giştî cîhana çand û zêhniyeteke hevpar pêk hat, ev yek ji bo netewebûnê qîm dike. Ji bo vê danasîna giştî ya netewe bêhtir sofîstîk bikin têgînên weke neteweya dewletê, neteweya huqûqê, neteweya ekonomiyê û neteweya eskerî (artêş-millet) çêdikin û ev neteweperestok kategoriyên cuda ne, neteweya giştî bi hêz dikin. Mirov dikare ji van re neteweya hêz û zorê jî bibêje. Yek ji armancên bingehîn ên moderniteya kapîtalîst pêkanîna neteweya bi hêz e. Ji ber ku neteweya bi hêz di warê sermayeyê de dibe xwedî îmtiyaz, dibe xwedî bazara berfireh, derfetên mêtingerî û emperyalîzmê. Lewma gelekî girîng e, divê mirov van neteweyên bi hêzkirî weke modela bi tenê ya netewe nebîne, heta divê mirov wan weke neteweyên şoven ên bi hêz û neteweyên di xizmeta sermayeyê de bibîne. Jixwe ji ber van xisletên xwe çavkaniya pirsgirêkan in. Modela netewe ya ji çandê netewe çêke, lê zordestî û mêtinkariyê bi gem bike û nexwaze, modela neteweya demokratîk e. Neteweya demokratîk, neteweya herî zêde nêzî wekhevî û azadiyê ye. Li gorî vê pênaseyê, ji bo civakên lêgerîna wan a azadî û wekheviyê heye, ev têgihiştina netewe ya herî di cih de ye.



Moderniteya kapîtalîst û sosyolojiya ji wê îlhamê digire, li ser kategoriya neteweya demokratîk nasekinin. Ev jî ji şêweyê avabûn û hegemonya wê ya îdeolojîk e. Neteweya demokratîk bi tenê qîma xwe bi hevpariya zêhniyet û çandê nayne, bi tevahî endamên xwe li saziyên xweser ên demokratîk digihîne hev û rêve dibe. Ev xisleta wê ya diyarker e. Şêwazê rêveberiya demokratîk û xweser ji bo netewebûna demokratîk şertê pêşî ye. Bi vî aliyê xwe alternatîfa dewleta netewe ye. Li şûna rêveberiya dewletê, rêveberiya demokratîk derfetekî mezin ê azadî û wekheviyê ye. Sosyolojiya lîberal, neteweyê yan bi dewleteke avabûyî re yan jî bi tevgerekê re ku armanca wê avakirina dewletê ye, wekhev dibîne. Sosyalîzma pêkhatî jî xwedî lêgerîneke bi vî rengî bû û ev jî hêza îdeolojiya lîberal nîşan dide. Moderniteya alternatîf a neteweya demokratîk moderniteya demokratîk e. Ekonomiya ji yekdestdariyê rizgarbûyî, ekolojiya bi hawîrdorê re lihevkirî, teknolojiya dostê xweza û mirovî, bingehê sazîbûna moderniteya demokratîk e, ango bingehê sazîbûna neteweya demokratîk e.

Ji bo civakên neteweyî weke şertên pêşî diyardeya welatek û bazareke hevpar destnîşan dikin, lê ev weke hêmanên maddî nabe ku weke xisletên diyarker ên netewe bêne hesibandin. Di vî warî de mînak Cihûne; demeke dirêj timî bêwelat man, lê di dîrokê de timî weke neteweyeke bi hêz li guher û goşeyên dewlemend ên dinyayê man, tevî ku bazareke wan a neteweyî tinebû ji wan hat ku li bazarên dinyayê bibin neteweya tekane ya herî bi hêz. Bêguman welat û bazar ji wan navgînan in ku dewlet-neteweyê bi hêz dikin. Ji bo welat û bazarê şerên herî zêde û xwînrij ên dîrokê hatine kirin. Welat weke milk, bazar jî weke qada karê gelekî bi nirx in. Têgihiştina neteweya demokratîk a welat û bazarê cihê ye. Neteweya demokratîk welat bi nirx û hêja qebûl dike, ji ber ku ji bo çand û zêhniyeta netewe derfeteke mezin e; çand û zêhniyeteke di bîra wê de nebe nîne. Lê divê mirov ji bîr neke ku têgîna welat-niştiman a moderniteya kapîtalîst fetîşe kiriye û xistiye pêşiya civakê bi armanca karê ye. Dîsa girîng e ku mirov welat zêde mezin neke, nenepixîne. Têgihiştina “Her tişt ji bo welat” çavkaniya xwe têgihiştineke neteweya faşîst e. Ya manedartir ew e, mirov her tiştî ji bo civakeke azad û neteweyeke demokratîk bike. Divê mirov vê jî negihîne asta perestinê. Ya esas û bingeh ew e, divê mirov jiyanê bi nirx û qîmet bike. Welat ji bo jiyana ferd û netewe bi tenê navgînek e, naxwe îdeal nîne.

Neteweya dewlet li pey pêkanîna civakeke homojen e, lê neteweya demokratîk bi giranî ji kolektîvîteyên cuda pêk tê. Ji ber ku cudatiyan dewlemendî dibîne û qebûl dike. Jixwe jiyan bi xwe bi cudatiyê pêkan e. Dewleta netewe ya ferz dike ku welatiyan bike tek tîp ên mîna ji tornayekê derketine, bi vî aliyê xwe bi jiyanê re jî li hev nake, berevajî ye. Armanca wê ya dawî afirandina mirovên robot e. Bi vê xisleta xwe jî ber bi hîçtî û netiştiyê ve diçe. Welatî û endamê neteweya demokratîk cuda ye û vê cudabûna xwe ji komên cuda digire. Hebûna qebîle û eşîran jî ji bo neteweya demokratîk dewlemendiyek e. Bêguman ziman bi qasî çandê ji bo netewe ne girîng e, û şertekî mecbûrî jî nîne. Mirov dikarin xwedî zimanên cihê bin û ji yek neteweyî bin. Çawa ku ji her neteweyekî re dewletek hewce nake, ji her neteweyî re jî zimanek an jî devokek hewce nake. Tevî ku pêdivî bi zimanekî neteweyî heye jî şertekî bivênevê nîne. Mirov dikare ziman û zaravayên cuda û cihê ji bo neteweyekî demokratîk dewlemendî bihesibîne. Lê belê dewleta netewe bi awayekî hişk tek zimanî ferz dike û vê dike bingeh. Pirrzimanî û jixwe pirrzimanên fermî bi hêsanî qebûl nake. Bi vî aliyê xwe hewl dide ji cihêwaziya neteweya serdest sûdê werbigire.



# Mihemed Bêrem: Ji ber metirsiya ji modêla demokrasiyê êriş dikin

Hevserokê Partiya Sûriyaya Pêşerojê li kantona Efrîn û Şehbayê, Mihemed Bêrem diyar kir ku dagirkeriya Tirk hewil dide ji tevahiya aloziyên Rojhilata Navîn sûd werbigre û bi rêya êrişan pergala Neteweya Demokratîk ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hilweşîne.

**Tekoşîn Amara/Qamişlo**

Di nava şer û qeyranên ku di Rojhilata Navîn de têne jiyan kirin de dagirkeriya Tirkiyê êrîşên hovane li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk têne. Di vî derbarê de hevserokê Partiya Sûriye Pêşeroj Li Kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Bêrem bersîva pirsên rojnameya me dan.

**Di demekê de ku tevahiya rojhilata Navîn di nava şer û aloziyan de ye, dagirkeriya Tirk êrişên berfireh li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê pêk tnîne, armanc çi ye?**

Dewleta Tirkiyê di Rojhilata Navîn de xwedî role û destwerdanê li tavahî dewlet û şerên ku têne jiyan kirin dike. Di şerê ku ji aliyê Îsrayî li hember Hemasê hatiye destpêkirin de dagirkeriya Tirkiyê yekser destwerdan li vê yekê kir, bê guman Tirkiyê ji xwe destwerdanê li vê yekê nake. Rûxmî ku di pişperdeyê de gelek siyaset û têkilî dihatin meşandin, lê tirsa Tirkiyê ew e ku ev şer derbasî nava xaka wê nebe ye. ji ber wê yekê di her alî de Tirkiyê di tavahî şer û siyasetên li Rojhilata Navîn de têne kirin de; mudexele dike.

Di aliyê din Hikuemta Tirkiyê di nava xwe de hilweşandineke aborî mezin jiyan dike, ev yek gele cara hêştiye ku gel nerazîbûna xwe derxîne. Dewleta Tirkiyê ji bo derbaskirina vê yekê yekser berê xwe dide herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ev êdî bûye terzê siyaseta Erdoxan, Difikire ku hebûna xwe tenê wê li ser bidawîkirina Kurdan bê berdewamkirin. Tirkiyê ya yekemîn dixwaze doza gelê Kurd ji binî de tune bike, ya duyemîn Tirkiyê ji Osmaniyan bigire heyanî hikumeya wê ya niha li ser xwîna gelan mezin bûye û divê tu sîstem û bîrdoziyên demokrasiyê dernekevin. Bi taybet bîrdoziya ku ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve derketiye holê.

Tiştê ku bala mirov dikşîne di demeke wiha de Rayadarên Tirkiyê vexwendina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Perlamenterên xwe dike û dandina daxuyaniyên ku daxwaza bidawî kirina PKK ê dike; ev bi serê xwe nakokiye. Hilweşîna Tirkiyê di sedsaliya pêşîn de dide nîşandan. Di nava xwe de nakokiyan jiyan dike û metirsiya wê ji pêşketin û belavbûna felsefeya Netewa Demokratîk ya ya ku xeta Moderniteya Kapîtalîst dirûxîne; diyar dike.

Ger Tirkiyê bixwaze xwe di sedsala pêşîn de mayînde bike, bê guman divê hin siyaset û tektîkên xwe biguherîne. Ye yekem serbestberdana Rêber Abdullah Ocalan û ya Salahtîn Demîrtaş her wiha serbestberdana zêdetirî 10 hezar girtiyên siyasî yên Kurd di Tirkiyê de. rakirina hemû zagonên urfî yên di Tirkiyê de, çareserkirina rêxistinên Qurîcîyan û bidawîkirina êrîşên xwe yên li ser tavahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û yên Başûrê Kurdistanê. Vê gave em dikarin bêjin ku Tirkiyê deriyên danûstandinê yên rast vekiriye.

**Li ku derê mirov tê qetilkirin û komkujî pêk tên yekser hêzên navneteweyî helwesta xwe nîşan didin, lê dema ku mijar Bakur û Rojhilatê Sûriyê û kurd bin her kes bêdeng dibe, sedema vê dirûtiyê çi ye?**

Belê; bê guman ev rastiyeke dema ku mijar dibe gelê Kurd tavahî cîhan



û dewletên navnetewî ker, kur û lal dibin. Rastiya dewletan li ser meşandina berjewendiyên xwe pêk tê, ji lewra dema em li dîrokê dinêrin bi sedan komkûjî derheqê gelê Kurd bi tavahî û qirkirina civaka Êzîdî de pêk anîne her wiha li Bakurê Kurdistanê qtlîama Dêrsimê li Geliyê Zîlanê zêdetirî 40 hezar kes hatin qetil kirin, Kurdên ku xistine şikeftan û derî li wan hatine girtin, kûmkûjiya Helebçeyê û bikaranîna çekên qedexekirî li ser çiyayên Kurdistanê. Ka raya giştî ji van hemûyan li kuye? dîrok li ser van hemûyan şahide û nayê ji bîr kirin. Lê ev komkûjiyên ku bi milyonan Kurd têde hatine tunekirin bi bêdengî hatine derbaskirin. Rûxmî ku dema gelek ango netewek derveyî Kurdan tundî li wan dihate kirin, dewlet û rêxistinên navnetewî banga edalet û mafê wan dikin.

Ev yek diyar dike ku hemû alî û dewletên navnetewî li ser pêkanîna berjewendiyên xwe lihev dikin.

**Li hemberî van êrişan pêwîste di milê qanûnê , hiqûqî û diblomasî çi were kirin?**

Bi pirsa me ya yekem ve girêdayî ye, hemû zagonên û peymanên di navnetewî de hatine derketin, ji aliyê dagirkeirya Tirkiyê hemû hatin binpêkirin. Rûxmî wê ne dewletên navnetewî hesab ji dewleta Tirkiyê xwest ne jî tu bertek li hember van binpêkirinan diyar kir.

**Hûn helwesta gel ya dewama berxwedan û têkoşînê ya li hemberî êrişan çawa dinrxînin?**

Ev gel bi salane li ser bingeha berxwedanî û têkoşînê hatiye mezin kirin, bi felsefeya Rêber Abdullah Ocalan re bi stratejiya şerê gelê şoreşgerî li hember dijmin li ber xwe didin. Dijmin li hember gelê Kurd hemû siyaset û pilnên qirêj meşandin, lê ev têkoşîn bi sala ye bi heman serkeftinê heyanî vê kêliyê tê domandin. Li ser van bingehan gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi şerê gelê şoreşgerî li ber xwe da û dîrkeke nû ya serkeftinê dinivîse, wê ev êrîşên heyî jî asta berxwedanî û hevgirtina gelan nexîne.

**Di demeke wiha histyar de hûn rol û misyona partiyên siyasî çawa dibînin û pêwîste di demên pêş de çi ji aliyê partiyan ve bê kirin?**

Em partiyên siyasî hebûn, hene û em ê hebin li kêlek îradeya gelê xwe, çawa ku gelê me bi li hember hemû êrîş û polîtîkeyên dijmin li ber xwe da û çawa ku rêhevalên weke Hevrîn Xelef û Nediye Xeşen di riya vê dozê de gihîştin asta şehadetê. Erka me ya esasî ew e ku em di nava gelê xwe de bin û em nameya gel û doza xwe bi riyên sîblomasî û îdeolojiya ku em li ser mezin bûne ji raya giştî û cîhanê re raghînin. Ji ber armanca Tirkiyê ew e ku vî gelî qir bike û sîstema Rêveberiya Xweser û netewa demokratîk têk bibe.

# Neteweperestiya seretayî a Kurd

**Volqan Elî**

Feraseta neteweperestî ya netew-dewletê, yan jî çêbûna neteweyên cur be cur wekî forma Awrûpî (neteweyên ku tenê çandekê esas digirin, tenê sînorê dewletekê bingeh digirin û hwd.) zêde ne li gorî rastiya Rojhilata Navîn e. Yanî ev feraseta netew-dewletê, ev forma neteweyan ku yek rengî, yek çandê esas digirin ji derve li ser Rojhilata Navîn hatine ferzkirin.

Awrûpa-cîhana Rojavayî piştî şerên xwînavî yê bi sedsalan, bi nijadperestî, olperestî û bi pêşengtiya moderniteya sermayedar, ji xwe re dewlet û sîstem çêkirine, xwîn û keda gelan tev kiriye xizmeta xwe. Dema ku êdî bi kêrê wî nehatiye, di dawiya dawî de ji vê feraseta netew-dewletê dest berdaye. Niha hewl dide hemû netewe-dewletên di serî de Rojhilata Navîn û li cîhanê dîzayn bike. Hemû ev pratîka wî nayê wateya ku ji neteweperestiyên xwe, dest berdaye. Na! eger îro di salekê de bi deh hezaran ereb û filîstînî ji bo projeyeke hêzên hegemon hatibe kuştin wateya wê ev e.

Dema ku em îro li xwe dizivirin, li Rojhilata Navîn û Kurdistanê dinêrin em bi çi re rû bi rû dimînin? Kurdistan sed salî ji beriya vê di nav çar netewe-dewletên dagirker de kiribûn çar parçe. Piştî pêvajoyeke tev jenosîd û pişaftin, wekî neteweya Kurd pirsgirêka me ne tenê yekkirina van çar parçeyên Kurdistanê ye; pirsgirêk ewqasî giran bûye hema bêje her Kurdek, bûye parçeyekî cuda. Di van mercan de hin hêzên ku xwe Kurd dihesibînin, tenê ji xwe re parçeyekî bingeh digirin, heta beşekî girîng ê wî parçeyî jî difiroşin dijminên Kurdan. Hûn ê bêjin berpirsiyarê vê kî ye? Bersiva vê pirsê ne ku nizanim li pişta kîjan çiyayî ye: Malbata Barzanî û paşxaneya dîrokî ya vê ‘malbata’ navborî hê bi êş e.

Tiştên ku em ê bêjin, ne gotinên me ne, arşîvên dîrokî ne: PDK’ê bi eslê xwe ne Partiyeke Başur e yan jî li Başûr nehatiye avakirin. Di avakirina wê de Malbata Barzanî ne xwediyê rolê ye jî. Lê piştî ku li Rojhilat tê avakirin bi demê re ew jî tevlî dibin. Werhasil, piştî ku PDK’ê ava dibe rêxistina xwe li Başur-Iraqê jî ava dike. Ev ji aliyê vê malbatê ve cara yekemîn wekî PDK’ê tê veguherandin bi rêxistineke malbatî.

Dema ku Komara Demokratîk a Kurdistanê ava dibe ew jî diçin cem Qazî Mihamed. Mele Mistefa Barzanî, berpirsiyarê ewlekariya Komara Demokratîk a Kurdistanê ye. Dema ku cîhan di mercên şerê cîhanê yê duyemîn de desteka xwe ji komarê dikişîne, Mele Mistefa, Qazî Mihemed û komarê li ber rehma Şahê Îranê dihêle û berê xwe dide Rûsyayê.

Di 1958’an de Abdul Kerîm Qasim li Iraqê bi derbeyekê dewletê dixe destê xwe û Mistefa Barzanî tîne cem xwe. Bi wî re gelek peymanan çêdike. Herwiha derfet peyda dibin ku herî kêm li Iraqê hinekê pirsgirêka Kurd çaraser bibe. Lê belê Malbata Barzanî, bi rêya berdevkê xwê yê li Libnanê nameyekê ji Nixsonê Serokê wê demê yê DYE’ê re dişîne ku ‘ew amade ne li dijî dijminên Emerîkayê şer bikin’. Di encamê de şerê bi Iraqê re ji nû ve dest pê dike. Dijminên Emerîkayê yên wê demê kî ne (salên 1960-70’î)? Di serî de Iraq e, hêzên komînîst ên Iraqî ne û ya herî girîng jî Kurdên welatparêz-şoreşger ên wekî Saît Elçi û Sait Kirmizi Toprak ku hewl didin li dijî dagirkerên Tirk dest bi şerê Gerîla bikin. Ev malbat çi dike? Bi komployekê, her du şoreşgeran (Sait Elçi û Sait Kirmizi Toprak) tasfiye dikin. Ne tenê ev, lê gelek partiyên welatparêz ên Rojhilat di demên cuda de tune dike. Dîsa li dijî gelek hêzên komînîst ên Iraqî di wan serdeman de kuştinan pêk tîne. Herî dawî di sala 1975’an de grupa YNK’ê ya di bin berpirsiyariya Elî Esker de tasfiye dike (li gorî hin daneyan hezar Pêşmerge tên şehîdxistin).

Ev tenê çend mînak ji kirinên vê malbatê ne. Eger hişmendî ev be ku ‘tenê ji malbata min re, tenê ji herêma min re tenê ji tebeqaya min re, tenê ji vî yan jî wî emperyalîst î’ sibe-du sibe ne dûr e ku li cem gelê ereb, li cem gelê fars pirsgirêkên sînoran derkevin. Mînaka Cotmeha 2017’an li ber çavan e. Qaşo propagandaya ‘serxwebûna Kurdistanê’ kirin. Ew jî bi defdana hin hêzên ji derve... di encam de hem gelê Kurd destkeftiyên xwe ji dest dan û hem jî netew-dewletên tirk, ereb û fars dubare gihandin hev. Armanc qaşo ‘netewe-dewleta Kurd’ bû. Wekî gotinek pêşiyan dibêje; Malbata Barzanî çû da ku birincê ji xwe re bîne, gelê Kurd ji savara li malê bû!

FENER



## Îmralî tekane rêya xelasiyê ye

**Idrîs Henan**

Rojekê zilamekî pîr, pendiyar û retkok tevî kurê xwe yê ciwan li sûkê dimeşîn. Ji wê ve tê xortek tewşan û milê xwe li milê zilamê pîr dikeve. Lê dizivire û jê re dibêje: Ma tu kerî? Zilamê pîr gelek bi asayî lê vedigerîne û dibêje: Na! Ew xortê beredayî ti bersivek din nade û bi rêya xwe ve diçe. Lawikê ciwan li bavê xwe dinihêre û bi hêrs jê dipirse: Te çima bersiva wî neda? Carek din bavê pîr bi aramî ji kurê xwe re dibêje: Wî pirs kir, min jî bersiv da! Kurik bi tengavî û kêrç li bavê vedigerîne: Tu newêrekiya xwe di bin siya pîrbûn û pendiyariyê de vedişêrî! Kalê pîr ti rêyan ji kurê xwe nake, lê di heman demê de dixwaze dersekî bide wî. Lew re tavilê lê dizivire û jê dipirse: Tu dixwazî biceribînî? Law bê ku bihizire, derhal pirsa bavê dibersivîne: Erê.

Bav û law carek din bi rêya wî xortê beredayî dikevin û hîcar rûbirûyî law tê. Dema milên wan li hev dikevin, ew xort lê dizivir û jê dipirse: Ma tu kerî? Lawê ciwan bi kîn jê re dibêje: Tu kerî. Wê çaxê dibe teqereqa gurmist û pêhênan. Toz bi ser wan dikeve û xelk li dora wan kom dibe. Yek ji xelkê dipirse: Ma hûn nikarin van herdû keran ji hev bikin? Herdû şerbaz lê dizivirin û dibêjin: Em ker in? Wî jî dikişînin nava şer. Pevçûna wan bi vî awayî carê kesekî dikişîne nav xwe û mezin dibe. Dawiyê de yekî hişmed nêzî koma şer û gengeşeyê dibe û diprise: Ma hûn nikarin van mirovan ji hev bikin?

Koma şerkeran lê dizivirin û bi sosretî jê dipirsin: Te got mirov, ma em mirov in? wisa wî jî dikişînin nava şer û bi vî rengî kaosa şerbazan berfireh dibe. Wê çaxê bavê pîr ê pendiyar destwerdanê dike û kurê xwe ji nava komê dikişîne ku rûyê wî tije xwîn û her dera wî werimî ye, û jê dibirse: Ma te bigota Na, ne baştir bû? Diyare hesabên Tirko û dûvikên wî yên odeyên şerê taybet û peyayên maskekirî ku kêfa wan ji navê (Rewşenbîrên Serbixwe yên Kurd) re tê, û propagandayên qebe di derbarê bapîrê wan (Hesen Xeyrî) de dikin, dê li ber peravên deriyên Îmraliyê û li pêşberî heybeta Qendîl, pendiyariya sergevazên wê û gerîlayên azadiyê dê werin serçogkirin. Li hemberî dek û dolabên serdestiya li Tirkiyê û hewldanên faşîzmê ya homojenkirina doza Kurd, fena salên 2016’an, berxwedana Rêveberiyên Xweser, Berxwedana Şaredariyan dest pê kiriye. Ev yek paralelî pêvajoya guherîn û veguherînê ku li herêmê û dunyayê dest pê kiriye, rû daye. Ev berxwedan wê ji qonaxa serdema nû re bibe sernavekî stun û wê di tayînkirina pêşeroja Tirkiyê, Kurdistan û herêmê de xwedî şopeke kûrwar a guherîna bingehîn be. Li kêlekî wê jî; dê bi têkbirina faşîzmê li Tirkiyê ku weke dawîtirîn kelehên netew dewlet e, tacîdar be.

Tirkiyê weke kurê ciwan lê hatiye. Hewl dide bi qebedayîtiyan serdestiyên xwe mayînde bike û bi dagirkeriyan jî tacîdar bike. Hemû seynalên sor li herêmê û dunyayê li ber “Ehmaqiya” faşîzma Tirkiyê lê didin. Tepkiyên wê jî yên weke lawê pîrê hişmend in, tivî dikin ku baş şimitiye xefka veguherînê. Çendîn hewl bide xwe berevajî bide îqnakirin, lê tevî wê jî nikare xwe dûrî bayî guherînê bigire û bi vî halî jî nikare xwe jê biparêze. Nêzîkatiyên xapînok ji doza Kurd re û piropagandayên hinek lîderên odeyên şerê taybet, hewldanên herî kirêt û kalsîk ên xweîqnakirinê ne. Eger Tirkiyê û desthilatdariya wê dest ji van rêbazên kevin bernede, dê bihêztirîn şeqam li rûyê wê bikeve. Êdî rêyên xwe jê bi yan de, nemane. Tekane rêgirtina li ber parçebûna muheqeq a Tirkiyê, aqilmendî û pendiyariya kalê pîr e.